

DEWLETNAME:

Nivîsareke bi Zimanê Goranî

MUSTAFA DEHQAN

WERGERA JI ÎNGILÎZÎ: TALAT ÎNANÇ

Di nav kelepûra (kevneşopî) Kurdî de nivîsarên resen ên Îslamî yên bi zimanê Goranî, yên ji rojavayê Îranê û ji bakurê Iraqê -ku mixabin beşek jê di nav bobelatên şer û pevçûnan de winda bûne- û wisa jî pê re, çendek vedîteyên ji destpêka vê sedsalê yên der barê edebiyata Goranî de nêrîneke kûr û fi-rehtir didin me. Her çendî ku ev nivîsarên em behs dikin ji deqên kelepûra heyameke derengtir bin jî, ew di heman demê de berhemên ji ked û xebatên, yanî ji ‘pirtûkên’ alim û rewşenbîrên Kurd ên berî hingê pêk hatine. Di vê babetê de, nivîsareke Goranî ya bi navê *Dewletname* ku di sedsala 18mîn de hatiye nivîsîn, xwedî girîngiye-ke taybetî ye, û wisa jî ji zanyariya Goranî re bûye bingehê nû. Ev nivîsar, bi taybetî ji pirsên derû-berên perwerdegehên gelek Kurdên Misilman ên ji rêçika Sunîtiyê re bûye bingeh. Ev nivîsara kurt,

xebateke Mela Xidir Rûdbarî pêşberî xwendevan dîke. Nivîsar, di nav berhevokên Îslamî yên Kitêbxana Hezretî Me’sûme de, li bajarê Qumê yê Îranê bi dest ketiye.

Kitêbxana Hezretî Me’sûme

Kitêbxana Hezretî Me’sûme ji hêla Hecî Seyid Ebû el-Fedl Tewliyat ve, di sala 1952yan de li bajarê Qumê hatiye damezirandin. Ev kitêbxane bi berhevkirina gelek kitêbên bi kîrîna tomerî (kîrîna liserhev) û wisa jî bi kîrîna yekeyeka gelek kitêbên lê zêdekirî, di demeke dirêj û miqîm de pêk hatiye. Qada berhevkirina Kitêbxanê dîroka Şîitiyê û Îslamiyetê bû. Karmendên Kitêbxanê, ji bilî hinek belge û bend û xalên yekane, berhevkirina xwe zêdetir bi nivîsar û kitêbên zimanên Farisî û Erebi ve girêdane. Ji dema destpêka berhevkirinê, berhevoka (koleksiyon) Kitêbxana Hezretî Me’sûme ji nêzikî pênc hezar nivîsar û kitêbên

kêmpeyda¹ pêk hatiye. Di nav van nivîsaran de berhevokeke Kurdî (Kurdish Majmû'a) jî heye ku sê nivîsarên Kurdî tê de ne. Yek ji van nivîsaran *Dewletname* ye û li jêrê tê ravekirin.

Nivîsara bi Jimara 635/3 ya li Kitêbxana Hezretî Me'sûme

Berhevoka bi jimara 635/3yê tomarîrî peywendîdarê kultura Kurdî ye û sê berhemên Kurdî yê bi navên *Zubdayê 'Eqîde* (bi Kurdî), *Î'tîqadnameya Mewlana Xalid El-Nexşebendî* (bi Farisî), û *Dewletnameya* bi Goranî² vedihewîne. Nivîsara bi navê *Dewletname* ya li bajarê Qumê (bi jimara 653/3yê) di nav berhevoka nivîsarên Kitêbxana Hezretî Me'sûme de cî digire. Li gorî ku li ser rûpelê pêşî hatiye diyarkirin û dibêje 'Ev kitêb *Dewletname* ye' û nivîskarê wê Mela Xidirê kurê Ehmedê Rûdbarî (1138/1725-26-1205/1790-91) ye. Agahiyên der barê jiyana Mela Xidir de kêman in. Ew kurê Mela Ehmedê ji gundê Rûarê (Rûdbar) ye. Ev gund, gundekî Kurdîstana Îranê ye, li herêma Navenda Awramanê (Awramana Text) cî digire. Ji bilî *Dewletnameyê* hinek xebatên wî yê din ên bi Goranî û bi Erebi jî hene, çendek jî helbest nivîsandine. Her çiqas ku di karê nivîsandinê de gelek çalak bûye jî, hetanî îro hîn gelek xebatên wî destpênebûyî mane.³ Rûpelê pêşî wisa nişan dide ku ev *Dewletnameya* berdest, paşê, hebekî hatiye berçavkirin. Li gorî gotina ku di serê rûpelê pêşî de cî girtiye (rûpel.113v.), *Dewletname* berhema rehmetî Mela Xidirê kurê Ehmedê Rûdbarî ye, lê ji hêla rehmetî Seyid Hesên Çorî ve hatiye veguhestin (neqlkirin). Çorî, zêdetir wekî Mela Ebûbekir Seyid Hesênê kurê Seyid Hîdayet, an jî wekî Mela Musenîfê Çorî tê zanîn. Ew alimekî Kurd ê gelek navdar e, ji gundê Çorê ye ku gundekî li Merîwanê yê Kurdîstana Îranê ye. Wî, ev nivîsar hem veguhestiye (neql kiriye) hem jî rave û şrove kiriye.⁴

Nivîsar ji 41 pelan pêk tê. Di her pelekê de (li ser rûpelekî) 12 rasterêz cî digirin. Sernavê pirtûkê bi nivîsa '*shanjarf*'ê (cureyekî nivîsa herfên Erebi), lê metnê nivîsarê bi hubra reş hatiye nivîsîn. Nivîsar bi zaravayê Goranî, bi devoka herêma Hewramanê ye. Serenavên beşên nivîsarê bi zimanê Farisî ne. Nivîsar bi herfên zelal ên destxet ên *nestelîk* hatiye nivîsîn. Navê katib ne diyar e, lê

li gorî ku di dûmahîkê de hatiye diyarkirin, kitêb di 28ê Adara 1883yan (20 Jumada I 1300) de ketiye ber qelemê. Wisa tê zanîn ku destpêka wê bêguman şipare diçe digiye sedsala 18mîn.

Naverok

Naveroka kitêbê jî çendek beşên cuda û cihê pêk tê. Nivîskar bixwe dibêje ku nivîsar ji bilî despêkekê û dûmahîka pirtûkê, ji diwazde beşan pêk tê (rûpel 117r). Nivîsar bi hinek helbestên pêşekî dest pê dike ku pesnê Xwedê, Pêxember, her Çar Xelîfeyan, malbata Pêxember an jî diwazde Îmamman, û wisa jî pesnê Ebû Henîfe, Muhemmed bîn Îdrîs, Ahmed bîn Henbel û gelek ulemayên din dide û ji vê derê jî derbasî '*destpêkê*' dibe (rûpel 117r), di pey re jî, hinek pend û şîretên li ser babetên exlaqî û rêwerzên (talîmat) der barê pratîkên Îslamîyetê de vedihewîne.

Sernavê beşa yekemîn "Qise li ser çi tiştên ku Xwedê wan diafirîne" ye û tê de gelek mijar û babet tene mitalekirin. Mijarên sereke yê vê beşê der barê ferq û cudahiyên di navbera kesên xwedî dewlemendiyên giran û gelê xizan de ne. Di pey re, teşîd û celebên cil û bergan û pêlavan, pakî û paqijî tene gotûbêj kirin û hinek peyv û daxuyanîyên li ser rojên hefteyê, ku li wê gorê, mesela di rojên sêşeman de divê meriv serê xwe kurr neke, an jî divê meriv rojên çarşeman neynokên xwe jê neke. Bi armanca ku pend û şîretên maqûl bêne diyarkirin, nivîskar carna, mînakan ji edebiyata Îslamî ya klasîk, mesela, ji *Heyat el-Heywana* el-Damîrî tîne (rûpel 126r).

Beşa duwemîn "Qise li ser çi tiştên ku hiş û bîrê (bîranînê) kêman dikin" e (rûpel 127r), zêdetir behsa mijar û babetên sincî û rewîştî (exlaqî) dike, behsa jîbîrkirinê û gelek rewş û rûçikên wê, behsa aqil, hiş û tégihîştinê dike.

Beşa sêyemîn (rûpel 129r) "Qise li ser çi tiştên ku hiş û bîrê (bîranînê) zexm û qewîn dikin" e. Berî her tiştî, ji bo hêza bîrdariyê li ser rol û rista dubarekirin û wekilandinê radiweste. Wisa jî dibêje gere meriv bi hewl û xwezleke zexm û qewîn lê bixebite da ku bîr û bîrdariyê bihêztir bike. Zêdetir bala meriv ber bi girîngiya Quranê ve tê kişandin û dibêje Quran navgîneke giyanî ye ku meriv bi hiş û bîrdariyê xurttir digihîne.

غیا لوت پری ضرورت پ زیا در جمع او مطولات
 دوا نوا چو پ هر کس خاغن تا بنویخه اگر چه پاسن
 تا بیخ نظرش میباشن نظر او دهنده نونود هفتن
 ماه رمضان شهر مبارک ای نظیره خیر در یادگار
 جو سجد نوه بنای سرور بند هم بای تا رخ سمور بیچند
 بچند عمارت تعمیرش کردیا حاصلش بی هم جو بودیا
 خدا بدامن باسلام دین پاکت ولایت بیخ آیین
 دواته بخیری با ایضه دبوغای مایث اقدر
 صد هزار صلوات صد هزار جفا بان در مع پاک روحه مضطرب
 کلام لولاه ملار محمد بنی علیه السلام
 حضرت علیه الصلوٰة و السلام
 ترجمه دو تام پذیرفت در ایوم چهارشنبه پر شهر جادی لاله افراشته

ار صاحبان نامن باخان اگر با مان اوبیت الامن
 سید شریفی داسته چو خاغن غزوه مردی علم عزو علی مال
 من بوکت تر نه وینا دین هر دو لا کفست بر مد پدین ستره دین
 مر باطفش پیش بخون کیم ایته هو الوواب ارحم
 خدا با حق چهارده معصوم ای چاره فضل چو کله بیخونوم
 سکت به بسته جلات دبوغول پری خاغن عام لغش چو خورول
 ای صبح طفیلیه بیاد می بیخ اجرم تا نام بنود نیه عنین
 کلمه اناس فذره بالمقول پارگی لفظ عذرم من قبول
 مینش با دلت نامر خاغن پیش نامر آسریانامر
 دواته خضری این احمدن محتاج رحمت خدای صیدن
 بیخش زده پای اغانان پ مکتبیا ن صاحب اقبالان
 بو به نمونه پ اقبالان نش اینده بو جو کمالان

Li gorî ku nivîskar xweş pê bawer e, hinek beşên xwarinan jî bandorên erênî û neyînî li ser hiş û bîranîne hene.

Beşa çaremîn “Qise li ser çi tiştên ku jiyane dirêj dikin” e (rûpel 132v). Rewşeke balkêş e ku nivîskar ji destpêkê ve rindî û delaliyê, wisa jî kesên rind û delal, berî her tiştî tîne ziman û dibêje, ew jîn û jiyane dirêj dikin. Dengên xweş, tevgerên bi bîr û baweriya bi Xwedê, û bi taybetî xweparastina ji xwarinên giran û zêde, pêdiviyên jiyaneke dirêj in.

Beşa pêncemîn “Qise li ser çi tiştên ku jiyane kin dikin” e (rûpel 135v). Li gorî vê beşê, di navbera tiştên herî girîng ên ku jiyane kurt dikin de şeng û şadiya pîr û tund, tîrsa ji nişka ve, qehr û kîn, şerm û şermezari, têkiliya zayendî ya bêqam û lape, pîrejin û hwd tên jimartin.


Beşa şeşemîn “Qise li ser çi tiştên ku dil geş dikin” e (rûpel 138r). Ji bo ku meriv xwedî dilekî geş be, nivîskar di navbera gelek tiştan de zûrâbûna serê sibana ji xewê, îtaeta ji Xwedê re, û

wisa jî baweriya bi Quranê girîng dibîne. Du beşên der barê rûmet û giramiyê (nav û dengê çê) de, li ser rûpelên di pey re ne: *beşa heftemîn* “Qise li ser çi tiştên ku rûmetê rûdixînin (ku nav û dengê meriv xera dikin)” e (rûpel 138v): û *beşa heştemîn* “Qise li ser çi tiştên ku rûmetê zêde dikin” e (rûpel 141r). Li vê gorê, tiştên ku nav û rûmetê diqedînin û tune dikin ev in: xerabî, bêexlaqî û bêedebî, xinişî (zexelî), hesûdî, çavbirçîtî, selexurî (qepalî) û hwd. Zimanxweşî, rûgeşî, qîmpêanîn û pêqaîlbûn, her wisa jî camerî dertêne pêş ku nav û rûmeta meriv bilind dikin.

Nivîskar beşeke bi navê “Qise li ser çi tiştên ku rohnîya çavan geş dikin û dîtina wan tûj dikin” jî li nivîsarê zêde dike. Ji bo vê yekê dîsa Quran rêya baştirîn e ku bînahiya çavan xurt û zexmtir dike. Hinguv, kehrok û ribês çendek ji xwarinan in ku hêz û qewetê didin çavan.

Beşa dehemîn, “Qise li ser çi tiştên ku qût û nanê rojane zêde dikin û xizaniyê dikujin” e (rûpel 143v.). Di vê beşê de ayetên Quranê yên

Fols. 153v-154r.



di vê babetê de, yên ji bo zêdekirina qûtê rojane hatine nivîsandin. Wisa jî dibêje ku gere meriv navê Xwedê her tim zikir bike. Her du beşên dawiyê (rûpelên 146v. û 148r.), duayên li raberî nexweşînan û bela û bobelatên nedîtî û wisa jî duayên daxwaz û lavayan û yên din ên Îslamiyetê vedihewînin (rûpel 151r.).

Wekî peyva dawî, divê meriv bêje ku *Dewlet-name* delîl û palpiştên xwe, bi berfirehî ji Quran û hedîsan, û ji helbestên Erebi werdigire û bi vî hawî di kirasê şîroveyeke rojane ya pêdiviya Îslamî de ye.⁵ Zimanê wê yê bi Goranî dibe ku bala gelek zanyarên zimannasiyê bikişîne. Ew ziman, ji devokeke kevn a Goranî hev girtiye û tê de gelek peyvên xwerû yên Goranî yên kêmpayda hene. Hin caran di nivîsarê de hinek peyvên bi Goranî, li derveyê rasterêze hatine şîrovekirin, û bilêv kirina wan û têgiha wan hatine diyarkirin. Hinekên ji van peyvên biwêjên teknîkî ne, ku belkî têgiha wan, di dema xwendina wê hînge de, ji hêla gelek xwendevanên Goranî ve, îdin nedihate fêmkirin. ✎

Çavkanî

- Dehqan, M. "The Kitab Rûla Bizani", *Hadis ve Siyer Araştırmaları 1/1* (2015): 203-211.
- Majîdî, M. H. *Musha'ira-nama-yi Marhûmayn: Ibn al-Qiziljî (Wajdî), Sayyid Hasan Chorî, Sayyid Muhammad Barzanjî wa Sharh-i Hal-i Mulla Ma'rûf Kuka'î* (Saqiz: Intisharat Saqiz, 2003).
- Musannif Chorî, Mulla Abû Bakr. *Siraj al-Tariq*, Ed. M. Hawramî (Sanandaj: Intisharat Kurdistan, 2008).
- Rûdbarî Awramî, Khidr b. Ahmad. *Iqbal-nama* (Tehran: Ihsan, 2007).
- Takistani, A. "Marammat-i Nusakh-i Khattî dar Astana-yi Muqaddasa-yi Hadrat-i Ma'sûma". *Gulistan Qur'an 30* (2000): 33-39.

Jêrenot

- 1 Jibo Kitêbxanê û bi taybetî jibo nivîsaran li (Takistani 2000) binêre.
- 2 Bi qandî ku ez pê agahdar im, nusxeya bi zimanê Goranî ne li ber dest e (mewcûd nîne). Lêbelê, ev nivîsar, ji hêla Abdulkarîm Muderis ve hatiye wergerandin bo zimanê Soranî. Li (Rûdbarî Awramî, 2007) binêre.
- 3 Ji bo jîneweriya wî û xebatên wî li (Dehqan, 2015) binêre.
- 4 Ji bo Seyid Hesên Çorî û xebatên wî li (Mecîdî, 2003; Musenif Çorî, 2008) binêre.
- 5 Bi taybetî rûpelên 126r, 126v, 130r, 132v, 133r, 135v, û 138r rûberî hev bike (bi hev miqayese bike).